Edîbê Maratê Herxweş û Sax e!

Apê Osnebiran

Roja me mirovekî mezin , mamoste Edîb Ibrahîm birêkir, li goristan û mezelê gundê Maratê , herkes li wir têdigeha ku em çiyakî birêdikin . Bi rastî jî , bavê pêşrew (Edîbê Maratê) li ba me tevan weha mezin bû . Min dil heye kû , rûpelek ji merem û kiriyarên mezim mamoste Edîb , ji xwendevanên hêja re ronî bikim .

Li payîza sala 1991 an , xwe li D.r Ebdilmecîd Şêxo , yê paşê di bin navê D.r Dilşad Sindî li ser rûpelên hejmarên pêşîn ji Newrozê ji xwendevanan re diyar dibû , digirt û doza vekirina korseke zimanê Kurdî dikir . Girseyê me Edîbê Maratê , bi hesanî ew kors ji van birêzan amededikir :

1- Edîb Ibrahîm . 2- Endeziyar memê Alan . 3- Endeziyar Çîwazê Şeman (Apê Osnebiran) . 4- Reşîd Bakîr (bavê Bêrîvanê) . 5- X.S. bavê ferzend . 6- M.Y. bavê Rêdî). 7- Piştî du rûniştinan D.r : Rozad Elî jî tevle wê xebatê dibû . 8- M.T Gerikanî (Şekerof) . 9- K.E. (Pertewê Şerqî) . Ev herdu birêz , bi derengî û li ser daxwaza mamoste D. r Ebdilmeçîd Şêxo têkelî korsê dibûn.

Li Nîsana 1995 an, çîvîna yekem li Helebê Siriyana Kevin li maleke niştimanperwer nêzîkî dibistana sêwiyan , komîta Newrozê civata pirawa , di rojeke bi baran de hate geradin , têde biriyara weşandina rojnameke xawrû bi Kurdî , di bin navê Newrozê de li Helebê wergitin . Komîta rêdeksiona rojnama Newroz ji van xebatkaran pêkdihat : 1- Rihmetî Edîbê Maratê . 2- Rûgeşê Şeng (Sinorê Yekta) . 3- Apê Osnebiran . 4- Memê Alan . 5- D.r Rozad Elî .

Li meha Gulanê , ya wê salê 1995an Li Helebê Eşrefiyê , li mala rihme li gornê Edîbê me , civîna yekemîn ji derçûna hejmara yekem a Newrozê hate girêdan , li wê civînnê weke şewêrmend û pispor Dir. Ebdilmecîd Şêxo hate pejirandin û lê beşdarbû .

Edîbê me , wî bi berdewamî û ta roja ji welêt ber ve Almaniya kocdikir ; di rûpelên newrozê de xwedî nivîser û berhem bû . Wî gotara pêşî , di hejmara pêşîn de bi navê (E. Goranî) nivisîbû û rûpela dudiyê xenland . Kuştina hevalê min , bi navê (M . Ararat) mamoste Edîb bavê Pêşrew , kurte çîrokek di rûpela -7-an hejmar -4- de wşand . Eve deqa wê çîrokê:

Kuştina Hevalê Min

Êvar bû , ji dûr ve , cira mala apê Ehmed dicirûsî . Wexta min deriyê hewşê vekir , kûcik bi min de rewî , apê Ehmed derket ber deriyê malê û pirskir :- Ew kî ye?. – Ez im apo , Mecîd e , Seyê we cî direwe , ne dihîşt ku ez di hewsê kevim . – Keremke Mcîd , were îro çend rojine şivanê me çûye mala xwe û pez jî , çi dibe – çi nabe .. loma me seg girêdaye .

Em çûn hundir , min pêlawên xwe êxistin û derbasî odê bûm , meta Nêrgiz , pişta xwe sipartibû stêr û di ber xwe de , dipilpilî . Temenê wê beramberî çel salî bû , lê rûyê xwe , yê paqij , tijî xem û kulên giran bûn zêdetir nîşandikir . Çavên wê weke ewrekî reş tijî baran bûn , hêstir dibarand , geh jî , ewna bi ***D.R(10)***